

Bûjenên benckir – metirsî û bandorên digel **Enfeksiyona singê**

Derbarê vê belavokê

Ev belavok li ser metirsiya **enfeksiyona singê** ye ku piştî **benckira gelemperî** derdikeve hole. Ev bandorek alî ye ku dibe piştî benckira gelemperî bê serê mirov. Ev belavok, sedemên enfeksiyona singê û tiştên di derbarê wê de dikarin bên kirin rave dike.

Benckirinên gelemperî ew derman in ku mirov dixê rewşekê ku dişibe xeweke giran. Ew ji bo hin neştergerîyan û prosedûran girîng in. Dema benckira gelemperî li dar e, mirov bêhiş e û tiştêkî hîs nake.

Hûn dikarin li ser malpera me derbarê cureyên bûjenên benckiran bixwînin, ku bi zimanên cuda li vir berdest in: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

Enfeksiyona singê çi ye û çima piştî niştergeriye tê dîtin?


- Kuxik belxemê ji pişikê diavêje. Belxem çilma di pişik û singê we de ye.
- Benckira gelemperî dikare bandorê li ser avêtina belxemê ji pişikan bike.
- Hin niştergerî dibin sedem ku kuxik biêş an jî dijwar be.
- Eger hûn nikaribin bikuxin û belxemê bi rehetî biavêjin, ew dibe ku di pişikên we de kom bibin û enfeksiyonê çêbikin. Bo nimune, iltîhaba singê yek ji cûreyên enfeksiyona singê ye.

Çiqas pêkan e ku ev yek biqewime?

Di van rewşan de bêtir pêkan e ku sînga we enfeksiyon bigire û piştî wê hewcedarî bi çavderîyê çebibê, eger:

- heke berê, nexweşiyek we ya demdirêj hebe yan jî berî niştergerîyê rewşa we pir xirab e
- piştî niştergerîyê kuxîna birehetî ji bo we dijwar be, bo nimune, eger niştergerî li zikê te hatibe kirin an jî hûn nikaribin xwe bi rehetî bilebitînin
- eger hûn çixarekêş bin.

Ji her 100 kesên ku ev metirsî tên dîtin



2–20 kesa re enfeksiyona singê hat dîtin

80–98 kesa re ne hat dîtin

Ev hejmar ji xebatên lêkolînan hatine wergirtin. Hûn dikarin li ser malpera me bibînin me ji ku ev hejmaran girtiye: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/evidence.

Eger sînga min enfeksiyon bigire wê çi bibe?

Tîma ku lînêrîna te dike dê hin testan bikin ku bibînin bê enfeksiyona wê ya sîngê heye yan na, û bê sedema wê çibe.

- Eger sînga we enfeksiyon girtibe, dibe ku dema bêhngirtinê hûn zehmetî bikişînin. Eger ev yek biqewime, tîma ku lînêrîna we dike alîkarîya we bike. Bo nimune, ew dikarin bi rêya rûpoşekê oksîjenê bidin we.
- Dibe ku sîng an jî pişt we biêşe û hûn xwe gelekî betilandî hîs bikin.
- Carinan dibe ku fişara we ya xwînê dakeve û dilê we bileztir lêbidê. Tîma we wê fişara we ya xwînê û rêjeya dilê we bişopînin.

Enfeksiyona sîngê bi çi şiklê tê derman kirin?

Tzîma lînêrîna te dike dikare gelek tiştan bike da ku enfeksiyona sînga we derman bike.

Antîbiyotîk

Bakterî yan jî vîrûs dibe ku bibin sedemên enfeksiyona sîngê. Heke sedema enfeksiyona sînga we bakterî bin, bijîşkên we dikarin antîbiyotîkan bidin we. Hûn dikarin bi van rêyan antîbiyotîkan bistînin:

- Kanûl ('dilopdank'), lûleyek plastîk û gelek zirav ku dikeve nav demara we
- hebên ku tên xwarin.

Şileyên navdemarî

Tîma we dikare bi reya kanûla rasterast bigihînin demara we. Ev, miqdara oksîjenê ya di pişa spî ya we da zêde dike. Ev, di heman demê de, di şera bi enfeksiyonê re dibe alîkar.

Oksîjen

Carinan hûn dikarin oksîjenê bi rêya maskeyekê yan jî ji lûleyên di poz de bikişînin. Oksîjen dibe ku hinek tengasîyê bide we û dev û pozê we ziwa bike.

Eger enfeksiyona we pir giran be, dibe hewcedarî hebe ku hûn li yekîneya lînêrîna siftî yan jî yekîneya girêdayîbûna bilind bimînin. Mekîneyek (amûreka bêhngirtinê (vantîlatorek)) ji bo bêhngirtina we dikare bibe alîkar. Hûnê bînin hedarkirin heke we hewcedarî bi vê makîneya hebe.

Fîzyoterapî

Tîma we dibe ku we bişîne cem fîzyoterapîstek ku rê we bide bê hûn bi çi şiklî baştir bêhnê bigirin û bikuxin da ku ji belxemê xilas bibe.

Çi dikare pêşiya enfeksiyona sîngê bigire?

Eger bijîşkê bencê pê bawer be ku metirsîya enfeksiyona sîngê bi we re heye, ew ê berî niştergerîyê bi we re biaxivin. Ew ê van yekan bi we re nîqaş bikin:

- çiqas pêkan e piştî niştergerîyê enfeksiyona sîngê bi we re bê dîtîn
- bê ti cûreyên dîtir ên benckirê ji bo we çêtir e yan na, bo nimune, benckira heremî
- gelo piştî neştergerîyê dê we hewcedarî bi lînên zedetir hebe ku metirsîya enfeksiyona sîngê kêm bike. Bo nimune, dibe ku we hewcedarî bi dermanên sivikkirina êşê yan jî fîzyoterapîyê çêbibe da ku hûn bi rehetî bêhnê bigirin.

Ez bixwe dikarim çi bikim?

Berî niştergerîyê

- Eger derzîya şewbê ji we re pêşniyar kirin guh bidin, ji ber ku ew dibe metirsîya enfeksiyona sîngê kêm bike.
- Eger hûn çixare dikişînin, berî hûn herin nexweşxanê bi şeş hefteyan hewl bidin ku devjêberdin. Eger hûn nikaribin devjêberdin, ev yek gelekî girîng e ku berî niştergerîyê bi çend rojan hûn navberekê bidin. Ev yek dibe sedem ku pişikên we, xwe ji zerara ji dixanê pêkhatiye paqij bike û li hember enfeksiyonê xurttir bibin.
- Alîkarî li ser www.nhs.uk/smokefree û www.cpoc.org.uk/stopping-smoking berdest e.

Piştî niştergerîyê

- Eger piştî niştergerîyê êşa we hebe, rasterast agahî bidin tîma xwe. Ew dikarin têr dermanên sivikkirina êşê bidin we da ku hûn bi rehetî bêhnê bigirin û bikuxin.
- Ew ê bê pêşniyarkirin ku hûn tiştên ron û şil vexwin. Ev dê bibe sedem ku belxema di pişikên we de nerm bibe û hûn bi rehetî bikuxin.
- Çi temrînên tîma we ji bo ku hûn piştî niştergerîyê bi rehetî bêhnê bigirin û bikuxin dane we, bikin.

Destjêkişandin

Em gelek hewl didin ku agahiyên di vê belavokê de rast û nûjen bimînin, lê em nikarin vê yekê dabîn bikin. Em ne li bendê ne ku ev agahiyên giştî, cewaba hemî pirsên we yan jî çareserîya hemû tiştên ku ji we re girîng in bidin. Divê hûn vê belavokê wekî rêber bikar bînin û bijareyên xwe û her xemên xwe bi tîma xwe ya bijîjkî re bipeyivin. Divê ev belavok bi serê xwe wekî şîret neyê hesibandin. Ev belavok ji bo armancek bazirganî yan karsaziyê nayê bikar anîn. Ji bo destjêkişandin a bi temamî li vir binêrin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Werger bi giştî, ji aliyê civata wergeran a Translators without Borders (Wergerên Bêşnor) hatiye kirin. Kalîteyên van wergeran tîn kontrol kirin da ku bi qasî ku dibe rast bin, lê metirsiya çewt wergerandin û çewt şîrovekirina hin agahiyan dibe ku çebibe.

Ji me re bêjin ka bê hûn çi difikirin

Em pêşwaziya pêşniyarên ji bo baştirkirina vê belavokê dikin.

Ger têbînîyên we hene ku hûn dixwazin pêşkêş bikin, ji kerema xwe bi riya e-mail bişînin li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anaesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG

www.rcoa.ac.uk

Çapa Şeşemîn, Mijdara 2024

Ev belavok wê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nixandîn.

© 2024 Royal College of Anaesthetists

Dibe ku ev belavok ji bo çêkirina bûjena agahiya nexweşan were kopîkirin. Ji kerema we, çavkanîya orijînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema we bi me re têkilîyê danin.